

# Year 1 Phonics Screening Check

Information for parents and carers

## Kontrolkirina Dengzaniyê ya Pola 1

Agahdarî ji bo dê û bav û çavdêran



### Dengzanî çî ye?

Dengzanî têkilîya di navbera tîp û dengan de ye û di hînbûna xwendinê de girîng e. Hin zarok di hînbûna xwendinê de têdikoşin, lewma girîng e ev zarok zû bîn diyarkirin. Bi vî awayî, mamoste dikarin ji bo alîkariya taybet plan bikin eger pêdivîya wan pê hebe.

### Kontrolkirina Dengzaniyê ya Pola 1 çî ye?

Kontrolkirina Dengzaniyê ya Pola 1 nixandineke kurt a dewletê ye ku ji mamosteyan re dibêje bê ka zarokê we çawa di dengzaniyê de pêş ve diçe. Ev kontrolkirin dibîne ku zarokê we çawa peyvên îngilîzî bi tîpên cuda bixwîne. Zarokê we wê bi mamosteyekî re rûne û jê bê xwestin ku 40 peyvyan bi dengê bilind bixwîne. Ev gotin 20 peyvên rastîn û 20 peyvên bê wate ne. Armanca peyvên bê wate ew e ku mirov bibîne ka xwendekar dikare zanîna xwe ya têkelkirinê bikar bîne da ku ji bîranîna wan a ku berê ew peyv ditibe, bixwîne. Ezmûn bi awayekî asayî 5-7 deqeyan didome. Eger zarokê we li ber xwe bide, mamoste wê kontrolê rawestîne. Ez ezmûn bi baldarî hatîye sêwirandin ku ji bo zarokê we nekeve strêse.

Armanca sereke ya Kontrolkirina Dengzaniyê ya Pola 1 ew e ku hun zaniyariyan bidin mamosteyê zarokê xwe ku dê rê bide wan ku ji bo fêrbûna zarokê we planbikin. Her zarokê ji hêla mamosteyekî ve yek bi yek tê nixandin û hemû salê xwendekar wê werin nixandin.

### Denzanî çîma girîng e?

Şareza û jêhatiyên Dengzaniyê ji bo hînbûna xwendin û nivîsandina bi îngilîzî pêwîst in. Ji bo serkeftî bibin, divê xwendekar dengên ku bi tîpên takekesî an jî komek tîpan ên cuda têne temsîlkirin, û jêhatibûna tevlihevkirina van dengan bi hev re fêr bibin da ku peyvyan bixwînin. Xwendevanên destpêkê divê fêr bibin ka meriv çawa dengên di peyvyan de bi lez û rewanî tevlihev bike da ku xwendinê û têgihîştina wan a nivîsê xera neke.

Ji kerema xwe, heger pirsên we yên girêdayî Kontrolkirina Dengzaniyê ya Pola 1 hebin, bi dibistanê re têkevin têkilîyê.

### Xizmeta wergerandina li ser telîfonê

Heger pêdivîya we bi alîkariya wergêran hebe ji bo ku hun bi dibistanê re bikevin têkilîyê, ji kerema xwe telîfonî 131 450 bikin, ji operatorê r bibêjin bê ka pêdivîya we bi kîjan zimanî heye û ji wan bixwazin ku telîfonî dibistanê bike. Ji bo alîkariya we ya ji bo axaftina we, operator dê wergêrekî li ser xetê bistîne. Ev xizmet belaş e.